

Zaza, soran, kurmanc û dîalektên ziman

Serdar Roşan

Herçiqas li ser gotina dîalektê lihevkirineke mişterek di nav zimanzanan de tune be jî hin tiştên mişterek hene. Ji ber hoyên cuda di nav zimanekî de dîalekt çêdibin. Yek ji wan zimanan ku dîalektên wî hene, kurdî ye. Bi kêmasî sê dîalektên berbiçav hene. Kurmancî, Soranî û Zazakî. Kurmancî li herçar parçeyan tê axaftin; Soranî li Kurdistana Îraqê û Kurdistana Îranê, Zazakî li Kurdistana Turkiyeyê. Li ber destê me lêpirsîneke zanistî nîne, lê bi qasî ku mirov dikare texmîn bike, sedî 70-75ê kurdan kurmancî, sedî 6-8 zazakî, sedî 10-15 jî soranî û yê mayî jî dîalektên din diaxifin...

Divê em hîsî tevnegerin û rastiya xwe û civata xwe aşkere dest nîşan bikin da ku di çareserkirina probleman de sergêjî peyde nebe. Îro kurdên zazakîaxêf, kurmancîaxîf û soranîaxêf û kurdîaxêfên dîalektên din ji hev bi giştî fam nakin. Li vir ez behsa kesên xwende û kesên ku serê xwe bi hînbûna dîalektên din ve êşandine nakim. Heke mirov rewşa kurdan ya heyî bîne ber çavên xwe, bi fikira min ev ne tişteki anormal e. Ji lewre ji hev famkirin wisa ne hêsa ye welew ku mirov bi yek zimanî jî biaxife. Herwisa her dîalekt di nav xwe de xwedî dîalektan e ku kesên bi van dîalektan diaxifin ew jî baş ji hev fam nakin.

Ez ê li vir çend nimûneyan bidim. Wek tê zanîn swêdî, norweçî û danmarkî sê zimanên cuda ne û sê dewlet û mîlet in. Yekî swêdî kare bi yekî danmarkî an jî norweçî re rûne û sohbetê bi yekî ji van hersê zimanan bike. Ev tişt jî bo hersê zimanaxêfan jî welê ye. Lê yekî swêdî ji axaftina yekî swêdî ku bi dîalekta Alvdalsmal, Jamtska û Gotlendska diaxêfe zû bi zû fam nake an jî qet fam nake. Yanî swêdiyek ji zimanên cîranan fam dike, diaxife, lê ji dîalektên zimanê xwe fam nake. Nimûneyeke din jî norweçî ye ku îroj li Norweçê du dîalektên norweçî wek resmî hatine qebûlkirin û bi herdu dîalektan jî di dibistanan de perwerde dibe, kitêb dihên çapkirin û xwendin.

Dîalektên swêdî li dibistanan nayên xwendin yanî ne zimanê perwerdekirinê ne; lê yekî xwende bi hêsanî ji norweçî û danmarkî fam dike ji ber ku norweçî û danmarkî him pir nêzî zimanê swêdî ne, him jî çî bi niviskî çî bi zindî bi wan re têkilî danîn hêsa ye.

Nexwe meseleya ziman, dîalekt, mîlet, ji hev famkirin û nefamkirin ne welê hêsa ne ku mirov ji bo wan qalibek dayne û yên lê bèn û yên neyên tesnîf bike û ji nav meseleyê derkeve.

Kurmancî, soranî û zazakî û kesên kurd yên ku bi dîalekt an jî devokên din diaxifin tevan ji xwe re gotine û dibêjin kurd û navê welatê xwe jî Kurdistan dizanin.

Helbet ji bo yekî soranîaxêf, kurmancîaxêf an jî zazakîaxêf pir xweş û hêsa ye ku dîalekta wî bibe zimanê resmî. Lê ya girîng yekî soran, kurmanc an jî zaza çî qasî amade ye ku dev ji dîalekta xwe berde û yeke din qebûl bike, di maneya ku ew dîalekt bi tenê bibe zimanê resmî?

Ez bi xwe ne bawer im ku yek ji wan jî bi dilxweşî vî tiştî qebl bike. Mirov gava ji dêya xwe dibe, ziman an jî dîalekteke ziman hîn dibe û ew tişt ji bo hestên insan dibe nasnameyek, devjêberdan welê ne hêsa ye.

Îro realîteya me ew e ku em du alfabeyan, çend dîalektan him devkî him jî niviskî bi kar tînin. Bikaranîna alfabeyê û biryardayîna vê an jî wê alfabeyê karekî teknîkî û siyasî ye û bi îmkanên praktîzekerinê ve girêdayî ne. Ji lewre çênabe ku mirov bi darê zorê çareser bike. Ji xwe îmkanên vê yekê jî nînin. Divê rê li ber geşbûna dîalektên kurdî neyête girtin û bi mentalîteya yek mîlet, yek ziman, yek dîalektê li meseleyê nenihêre. Li Kurdistana Îraqê **problemeke kurdan bi erebî, turkmenî, kildanî û asûrî re nîne; dê pir ecîb be ku dîalekteke zimanê xwe bikin problem û pêşî lê bigirin. Herwisa ji bo parçeyên din yê welatê me jî welê ye.**

Nexwe divê kurdî bi dîalektên xwe ve geş be, xurt be û bi hev ve bikemile. Bi fikira min rêlibergirtin an jî kuştina yek ji wan dîalektan kuştina parçeyek ji kultur û civata kurdan e. Ya girîng azadiya mîlet û welatê kurdan e, gava ev pêk bê, welatê me têra hemî kurdan dike da ku serbest bijîn. Herçî meseleya yekbûna ziman e, divê em wê bispêrin rojên pêş da ku bê zordarî û bi têkelbûn, bi hev ve kemilîn, perwerde û bi geşbûn û pêşketina bajarvanî û civatê re yekîtiya ziman bi awayekî xurustî pêk bê.

Ji hêla din de gelek nimûneyên siyasî yên dewletan hene. Li Îspanyayê îspanî, katalan û bask hene; li Swîsreyê, çar grûbên etnîkî û zimanên cuda û resmî hene, li Hindistanê zêdeyê deh zimanên resmî hene, li Afrîkaya Başûr hakeza zêdeyî deh zimanên resmî hene, li Norweçê wek me li jor jî got, du dîalektên resmî hene, li Fînlândayê du zimanên resmî hene, li Kanadayê du zimanên resmî hene...

Ji lewre divê mirov li gorî rewşa xwe ku li maf û daxwazên însanî digunce û nabe sebebê têkberina kultur û jiyanêke zindî ya xelkî, bi rêyeke demokratîk, bi sebir û tolerans li meseleyê hûr bibe û çareser bike.